

**CEBRAÏL (*)
HÎTLER, STALÎN,
MÛSOLÎNÎ, ÇORÇIL
Û MASIYÊ ZEFERÊ**



Gelek caran gava îşê yekî hebe an tişteki wî winda bibe diçe nik falçî an remildarekî û li fala xwe dide nihêrtin. Ev ji bo mirovine adetî ye. Lê herçî serekên vî şerî nikarî bûn li xwe deynin û herin cem falçîkî. Ji lewre çûn ba Cebraîl û jê pirsîn: gelo kî ji me her çaran vî şerî wê bibe serî û bigehe zefere?

Cebraîl di keviya bêrmekê de rûniştî bû û li masiyê ko di nav bêrmê de diçû dihat temaşa dikir. Milyaketê salxwirde, sere xwe hilda û gote wan:

- Yê ko ev masî girt û ji avê deranî ewê zora hemiyana bibe û bigehe zefere.

Mûsolînî hema ji hindav de rabû, xwe şidand, mehmûzên çîzmeyên xwe li hev da, û bi silaveke faşistî qesta pêş kir û wek denekî xwe berda avê. Bêrm fireh, av kûr û masî jî mezin bû.

Dûçe li avê welê gêr bû ko li xwe wergeriya û her du lingên wî li rûyê avê xuya kirin. Bû keftelefa wî. Ji Hîtler ne

biwa ew tê de difetisî. Dor gihaştî bû Hîtler. Rêberê elman firehî û kûrahiya avê pîva, giraniya avê da weznê û di derenceyê re daket bêrmê û berê xwe da masî û ew ajot heta cihekî teng. Li wê derê bi her du baskên xwe li masî hate were ew xiste nav çemberê û girt. Hîtler masî di himbêza wî de di derencê re bi hewa ket. Lê dema gihaşte pêpinga paşîn lingê wî şemitî, li xwe qelibî û msî ket avê.

Stalîn got ev îşê min e, hêz da xwe û wek rawirekî li avê raperî û dirêjî masî kir. Masî

jê tirsîya, baskên xwe vekirin û wî jî ajote ser Stalîn, bû şerê wan. Masî rahişte simbêlên Stalîn û bi perçekî goşt nivê simbêlên Stalîn rakir. Stalîn destê xwe danî ser birîna xwe û ji avê derket.

Her siyan li hev nihêrt. Yekî got: Ma Çorçil li kû ye? Dor gihiştîye wî bila ew jî xwe biceribîne. Lê geriyan, Çorçil di quncikekê de, xwe li keviya bêrmê pehin kiri bû û bi kulmekî xwe ava bêrmê vala dikir!!.

(*) Ji Kovara RONAHÎ hejmar 4-Çarşemb 1ê Tîrmeha sala 1942an

Destên sipî yên Kurd

Li 17 .9.2624k – 2012 z giropek ji xortên me yên Kurd li Heleb, li hev civîn . Piştî donûstondnekê bi hev re , dîtin ku tîkeldariya wan bi hevdû re , bi awakî rêxistinkirî zor girîng e , ji ber wê nav li xwe kirin (D. S .K) û rêvebiriyek ji xwe re hilbijartin. Herweha hêza xwe kirin xizmeta Desteya kurdî ya bilind . Di wê civînê de ,Çalakiyek dane berxwe .Ew Galakî danesera pagijiyê ji herdu taxên Eşrefiyê û şexmêgûd re, di bin Sîwana (D.K.B) de, û bi alîkariya (E.N.K.S) û (E.G.R. ê) bû . Danesera pagijiyê ji 21.9 .2012 roja îne ,li kat (9) ê sibê , li dawiya Eşrefiyê dest pê bû .